BE ÇIRPEWE

Zana Qasim Dizeyî .....

<u>NIHÊNÎ REŞPOŞÊK</u>

MANGE ŞEW CIWANE LE ŞEWÊ
KE HEWIR BER ÇAWÎ NEGRÊ
BELAM FAYDEY ÇÎ KE XOR BÊ Û
BERÎ HETAWÎ NEGRÊ?!
RENGÎ ŞEWIM BOT POŞÎWE
WERE LE ŞEWIMA BA BITPARÊZIM
EY TIRÎFEY XOŞEWISTÎ
EY CÊGAY EW PERÎ RÊZIM…

<u>ŞEWANE YAD</u>

EM ŞEW LE HEMÛ ŞEW ZIYATIR
XOŞIM DEWÊY
BO HER LAYEK RÛ WERDEGÊRIM
TO LE WÊY
LE ÇAWÎ MANG
PIRŞINGÎ ÇAWIT DEBÎNIM
XWAYE ROJ NÊ
KE TO HER MÎWANÎ ŞEWÊY...

<u>TAWANÎ PERÇEM</u>

DERHEQ BE EBROT TAWAN KARE KE DADEPOŞÊT
HÎLALÎ YEK ŞEWEY ASIMANÎ RÛT, PERÇEM

DE LADE EW PERÇEMET TA MINÎ DÊWANE Û ŞÊT
ŞAD BIM BE BÎNÎNÎ MANG Û SATÊ DÛR KEWIM LE XEM
HER WEK ÇON PERWANE LE ŞEM NIZÎK DENÎŞÊT
HEZ EKEM NIZÎK BE TO MINÎŞ JÎNIM BE SER BEM…

BO LOME KARÊK

SÎNET HÊND NERME
DIL DEXEWÊNÊ
NAWIT HÊND GERME
ZIMAN DESÛTÊNÊ
BOYE DIL CANTAY XEM WA BE ŞANÎ
TOŞ LE NÊW ŞI`IRIM BÊ NAW Û NÎŞANÎ..

NASNAME

(TO KÊY?!)
HEMÛ CAR XEYAL LÊM EPIRSÊ.
PEYKERÊKIM LE WILATÎ GUNAH
ÇAWIM GUNAH EBÎNÊ Û
GWÊŞIM HERAM EBÎSÊ
PEYVÎ DEMIM HERAM E Û
DESTIM GUNAH ENÛSÊ...

MERAM

TOM LE ŞI`RÊK DA WÊNA KIRD
NAWIM LÊNA XOŞEWÎST
NAWÎ TOŞ AWAZÊK BÛ
PIR BE PÊSTÎ ŞI`REKE,
BE YEKEWE
MIN Û TO Û ŞI`R Û NAWIT
BÛYIN BE GORANÎ JIYAN…

NIŞÛSTÎ

KE TOM NASÎ,

JIYANIM NASÎ...
KE JIYANIŞIM NASÎ,
TOM XOŞWÎST...
KE TOŞIM XOŞWÎST,
RIQIM LE JIYAN BÛYEWE...

ŞERTÎ WEFA

RENGÎ ÇAWÎ TO, RENGÎ BEXTIME
RÊGAY EŞQÎ TO, RÊGAY SEXTIME
NAMEWÊ BÊ TO HÎÇ PILE Û PAYEK
LE DUNYA CIWANÎT PILE Û TEXTIME
WELÊ ŞERTE TOŞ XAWEN BELÊN BÎT
ÇÛNKE MIN BO XOM WEFA ŞERTIME...

WÊNEY TO

LE RAMANÊK DA BE DIYAR WÊNEY TO:
LE EBROT MERGÎ (WALAS) DEBÎNIM Û
LE LÊWEKANIT TÊNÛYETÎM GIR DEGRÊ Û
LE GERDINIT KÊWÎ BEFRÎN Û
LE SER SÎNEŞIT
HENASEM SIWARE Û
LE NAW GELÎYEKEY
BE SER DIREXTÎ WIÇANÊ HELDEZINÊM...
LÊ LE ÇAWANIT
CIWANÎM ZELÎLE Û
BÛNÎŞIM NEBÛN…

BO GILKOY AZÎZÊK

KAM QEDER DESTÎ BE BEROKIT GÊRA
KAM ECEL HAT Û BE TOY ŞÊR WÊRA
TAKE ÛMÊD BÛY BOYE BE KOÇIT
DUNYA REŞ POŞ BÛ Û ŞÎNÎ DEGÊRA..